



Li Tirkîyeyê du hefteyên dawîn

1-15ê Îlonê, 2022

1ê Îlonê, 2022

Polîsan li Kadikoya Stenbolê daxuyaniya Roja Aştiyê asteng kir, 100 kes hatin binçavkirin

Di 1ê Îlonê de ku wekî Roja Aştiyê ya Cîhanê tê pîrozkirin koma ku di nav de wekîlên HDPyê û Dayikên Aştiyê jî hebûn, li navçeya Kadikoyê ya Stenbolê li ber Bendergeha Karakoyê xwest ku daxuyaniya çapemeniyê bidin. Polîsên ku destûr nedan daxuyaniya çapemeniyê, piştî ku dora komê pêçan, her kes binçav kirin. Di nav kesên hatin binçavkirin de Dayikên Aştiyê, hevberdevka Kongreya Demokratîk a Gelan (HDK) Dîdem Nur Acabey, hevseroka Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) a Stenbolê Îlknur Bîrol, endama Lijneya Rêveberîya Navendî ya HDPyê Elîf Bulut, hevseroka Navçeyê ya HDPyê Ayten Bîngol, hevseroka Navçeya Bakirkoyê Gonca Yangöz, hevseroka navçeyê ya Beylîkdüzuyê Adalet Unlu, Hevserokên navçeya Kadikoyê Nurten Karagoz û Koray Turkyay û endamên Meclîsa Jinan a HDPyê hebûn.

Polîsan 100 kesên ku bi hinceta li dijî Qanûna Civîn û Xwepêşandan a bi hejmar 2911an hatibûn binçavkirin birin Midûriyeta Ewlekarîyê ya Stenbolê û Midûriyeta Ewlekarîyê ya Navçeya Çekmekoy Alemdagê. Kesên hatin binçavkirin piştî îfade dan, di heman rojê de serbest hatin berdan.

Şaredariya Yenîşehîrê ya Mêrsînê ya CHPî destûr neda Konsera Roja Aştiyê

Şaxa Mêrsînê ya Komeleya Mafên Mirovan (IHD) biryara qedexekirina konsera ji bo 1ê Îlonê rawestand, li gel vê yekê jî Şaredariya Yenîşehîrê destûr neda konserê.

Walîtiya Mêrsînê konsera ji bo pîrozbahîya 1ê Îlonê ku Roja Aştiyê ye qedexekir. Li ser vê yekê IHDyê serî li Zyemîn Dadgeha Îdarî ya Mêrsînê da. Dadgehê biryara qedexekirinê rawestand. Lê belê Şaredariya Yenîşehîrê ya ku di bin rêveberîya Partiya Komarî ya Gel (CHP) de ye serîlêdana komîteya amadekar red kir. Konsera ku ji aliyê Walîtiyê ve hatibû qedexekirin, dihat plankirin ku di 2ê Îlonê de li Navenda Çanda Atatürkê ya Şaredariya Yenîşehîrê bê lidarxistin. Li gorî bernameyê dê Pinar Aydinlar û Dodan derketina ser dikê.

Der barê Celal Şengör de bi îdiaya ku "heqaret li nixên olî kiriye" lêpîrsîn hat vekirin.

Der barê profesore jeolojiyê Celal Şengör de bi îdiaya ku "bi eşkereyî heqaret li nixên olî kiriye" lêpîrsîn hat vekirin. Dozger Turşad Kunthan Uçuk gazî Şengör kir ku biçê îfade bide. Turşad Kunthan berê jî stranbêja popê Gulşen sewqî girtinê kiribû.

Lêpîrsîna der barê Şengör de ji ber gotinên wî yê di 23ê Gulanê de di weşana Habertürkê de gotibû dest pê kir. Şengör wiha gotibû : "Nayê zanîn ka kesekî bi navê Îbrahîm jîyaye an na. Hemî kesên ku behsa wan tê kirin di dîrokê de tune ne. Tiştê ku em îro jê re dibêjin "olên Îbrahîmî" ev in: Cihûtî, Xirîstiyani û paşê jî Îslam. Tu li Cihûtiyê dinêrî, dibêjin Mûsa pêxember e û dîrok jî wî mirovî nas nake. Navekî wisa nîne."



2ê Îlonê, 2022

Di Mîtînga Aşitiyê ya Wanê de tundiya polîsan a li hemberî rojnamegeran

HDPyê li Wanê mîtînga "Roja Aşitiyê ya Cîhanê" li dar xist. Rojnamegerên ku ev miting dişopandin, dûçarî lêdana polîsan man. Polîsan rojnameger Mesut Bağciyê ku nûçe dişopand li erdê xist û kameraya wî şikand.

Polîsekî jî bi gotinên xwe yê, "Ez ê we gulebaran bikim, kes we nabîne" gef li nûçegihana Ajansa Mezopotamyayê Bêrivan Kutlu û nûçegihana Jin Newsê Zelal Tunç xwar. Heman polîsî li nûçegihana Jin Newsê Elfazî Toral re çek kişand.

Konserên Aleyna Tilki û Xecê hat betalkirin, Festîvala Hemdem a Fethiyeyê jî her wisa

Konsera stranbêj Aleyna Tilki ku dê li Çorumê di çarçoveya "Festîvala Birinca Elmasê" de pêk bihata hat betalkirin. Beriya mihrîcanê di 27ê Tebaxa 2022an de Serokê Şaxa Diyanet-Senê ya Çorumê İsmail Şanal banga betalkirina konsera Tilki kir. Aleyna Tilki di 2ê Îlona 2022an de li ser hesabê xwe yê twitterê ragihand ku konsera wê hatiye betalkirin.

Festîvala Hemdem a muzîkê (Çağdaş Fest) ku dê di navbera 7-11ê Îlonê de li Fethiyeyê bihata lidarxistin, beriya destpêkirinê bi rojekê hat betalkirin.

Qeymeqamtiya navçeyê wiha ragihand ku "destûrên pêwîst nehatine standin" û rîskên heyî wisa rêz kir: "xisardayîna hawîrdorê, fikarên ewlehiyê, îhtîmala şewatê". Organîzator Çağdaş Adigüzel, anî ziman ku hemû destûrên festîvalê hatine girtin û got, "Her ku em bédeng bimînin, sektorek mehkûmî hilweşandinê ye."

Li gorî çapemeniyê di 4 mehên dawî de bi giştî 10 festîval û 16 konser hatine betalkirin.

5ê Îlonê, 2022

Hat diyarkirin ku li ser daxwaza Midûriyeta Giştî ya Ewlekarîyê derbarê 20 rojnamegeran de dosye hatiye vekirin.

Li ser daxwaza Midûriyeta Giştî ya Ewlekarîyê derbarê 20 rojnamegeran de dosye hatiye vekirin (20 rojnameger hatine fişkirin). Di nav van rojnamegeran de Hevseroka Komeleya Rojnamegerên Dicle Firatê (DFG) Dicle Muftuoğlu û Serokê TGSê Gokhan Durmuş jî hene. Belgeya bi îbareya nepen, di dosyaya doza ku Muftuoğlu dihat darizandin de derket holê.

Di belgeya dosyeyê de tê gotin ku gotarên rojnamegeran di kovara bi navê "Journalist Post" de derketine û tê îdiakirin ku kovara navborî bi rêxistina Fetullah Gulen ve girêdayî ye. Navê 18 rojnamegerên din ên ku derbarê wan de bi nepenî agahî hatine berhevkirin ev in: Engin Sağ, Şemsi Açıkgöz, Mustafa Kılıç, Yüksel Durgut, Ramiz Kılıçarslan, Necdet Çelik, Hasan Çocuk, İsmail Muhammet Sağıroğlu, Enes Cansever, Basri Dogan, Turkmen Terzi, Vedat Demir, Rabia Yavuz Ture, Yunus Erdoğan, Naciye Nur Kılıç, Erkan Pehlivan, Mustafa Kuleli û Erkin Emet.



6ê Îlonê, 2022

Seroka Odeya Mîmaran a Enqereyê bi biryara Wezaretê Karên Navxweyî ji karmendiyê hat dûrxistin.

Seroka Odeya Mîmaran a Şaxa Enqereyê Tezcan Karakuş Candan ji ber têkoşîna hiqûqî ya ku li dijî hin projeyên îmarê yê li Enqereyê dida, bi biryara Wezaretê Karên Naxweyî ji wezîfeya xwe ya karmendiyê hate bidûrxistin. Hikûmetê Candan gelek caran wekî hedef nîşan da. Karakuş Candan li Şaredariya Çankayayê dixebitî.

Candan di Doza Kuleyên TOGO'yê de bûbû alîgir. Şûraya Dewletê der heq Kuleyan de biryara "îmhakirinê" girtibû. Xwediyê projeyê Parlamenterê berê yê CHPyê Sinan Ayyun gilîyê Candan li Wezaretê Karên Naxweyî kiribû.

Sinan Ayyun ev gilî bi hinceta "peywira xwe îhmal kiriye û qezenca neheq kiriye" kiribû. Li dû wê di 15ê Çileya 2022an de der barê Candan de lêpîrsîn hat destpêkirin. Di 18ê Gulana 2022an de 18emîn Daîreya Şûraya Dewletê destûra lêpîrsînê ku bi hinceta "îhmalkirina erka xwe" hatibû dayîn betal kiribû. Ligel biryara betalkirinê ya Şûraya Dewletê, Lijneya Bilind a Dîsîplînê ya Wezaretê Karên Naxweyî biryara "bidûrxistina ji karmendiyê" da.

Karakuş Candan di daxuyaniya xwe de ragihand ku Alîkarê Wezîrê Karên Naxweyî Mehmet Ersoy berê Waliyê Kirşehîrê bû. Mehmet Ersoy serokê heyetê bû ku biryara bidûrxistina Candanê da. Candan got ku "Em gelek caran di dozên ku me li wî bajarî vekiribûn de bi Mehmet Ersoy re rû bi rû diman, ji ber ku wî erdê Qonaxa Hikûmetê pêşkêşî TUGVAyê kiribû. [Weqfa Ciwanan a Tirkiyeyê (TUGVA) ku di sala 2014an de bi malhebûneke berdelî 500 hezar TL hat avakirin, di sala 2016an de bi biryara Lijneya Wezîran statuya muafiyeta bacê wergirt. Kurê Serokomar Erdogan jî di nav endamên Lijneya Şêwirmendiya Bilind a Weqfê de cih digire. Kadroyên rêveberiya weqfê ji kesên girêdayî Partiya Edalet û Pêşketinê pêk tê. Di nav hevkar, şîrîk û piştgirên weqfê de li gel hin wezaretan, bankeyên giştî û şîrketên telekomê jî hene. Li gorî raporên di çapemeniyê de diweşin, di sala 2018an de, weqf xwediyê nûnerîya 81 bajar û 570 navçeyan bû. Ji 306,000î zêdetir endamên wê yê qeydkirî û 38 wargehên wê hebûn. Li gorî agahiyên li ser malpera weqfê, di sala 2022an de hejmara wargehan 41 e. Der heq nûneriyên derwelêt de tu agahî tune ye. Ev demek e îdiayên cuda yê der barê bexşên ku ji weqfê re hatine kirin û avahiyên giştî yê ji bo weqfê hatine veqetandin di rojevê de cih digirin. Herî dawîn hate îdiakirin ku weqfê gelek kes di artêş, teşkilata ewlekarîyê û di burokrasiyê de bi "torpîlê" wezîfedar kirine.]

7ê Îlonê, 2022

Der barê pirtûka Figen Yuksekdagê biryara qedexeya firotinê û tunekirina wê hat girtin.

Weşandin, belavkirin û firotina pirtûka bi navê "Dîwarên ku dê hilweşin" ya Hevseroka berê ya HDPyê Figen Yuksekdag, bi îdiaya "propagandaya rêxistina terorê" hat qedexekirin. Figen Yuksekdag ji Mijdara 2016an ve di girtîgehê de ye. Bi ser de jî, biryar hat girtin ku nusxeyên pirtûkê yê belavbûyî bîn komkirin û bîn tunekirin. Pirtûk der barê qedexeyên derketina derve yê sala 2015an de ye. Hin gotinên ku di pirtûkê de cih digirin wekî "propagandaya rêxistinê" hatiye qebûlkirin. Gotinên navborî ev in: "Mirovahî li kevîyên tunebûnê diperpîte, dema jêzemîn dişewitîn, dema zarokên di malen xalî de bi tariyê dihatin pêçekkirin û ji serê xwe dihatin gulebarankirin".



8ê Îlonê, 2022

Dozger û dadgera ku Serokê Navçeyê yê MHPyê girtibûn hatin sirgûnkirin

Piştî şerê li Edliyeya Karaburun a Îzmîrê dozgerê Komarê Muhammet Miraç Yılmaz, Serokê Navçeya MHPyê Erkan Ozen ku yek ji gumanbarên êrîşê bû û 8 kesên bi wî re sewqî girtinê kir. Dadger Cansu Kurucu Yılmaz jî ku hevîna Muhammet Miraç Yılmaz e îtiraza li hember girtinê red kir. Li dû vê bûyerê Muhammet Miraç Yılmaz û Cansu Kurucu Yılmaz sirgûnî navçeya Siwêregê ya Şanlıurfayê hatin kirin.

Di 7ê îlonê de ji ber tunebûna dozger û dadgeran li Edliyeya Karaburunê danîşîn pêk nehatin, li ser vê yekê derket holê ku dozger û dadger hatine sirgûnkirin. Erkan Ozer ê MHPî jî îro hat berdan.

12ê Îlonê, 2022

Gulser Yildirima ku cezayê wê qediyabû, nehat berdan, parlamenterên Partiya Demokratîk a Gelan ev mijar xistin rojê Meclîsê

Gulser Yildirim dema ku Parlamentera Mêrdînê ya Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) bû, parêzbendîya wê hat rakirin û hat girtin, tevî ku cezayê wê qediya jî nehat berdan.

7 sal û 6 meh cezayê girtîgehê li Gulser Yildirimê hatibû birîn. Ji bo ku înfaza cezayê wê biqede, piştî erêkirina biryara Dadgeha Bilind divîya 5 sal û 7 meh û 16 rojan di girtîgehê de bima. Lê belê ji ber ku Dadgeha Bilind cezayê wê nepejirand, Yildirim 3 meh in tevî ku înfaza wê qediyaye jî bi awayekî derhiqûqî di girtîgehê de tê girtin. Parlamenterên HDPyê yên Mêrdînê Ebru Gunay û Pero Dundar ji bo sedema vê bêhiqûqiyê pêşnîyaznameyek pêşkêşî Wezîrê Dadê Bekîr Bozdağ kirin.

13ê Îlonê, 2022

Rojnameger Sînan Aygul ji ber nûçeya xwe hat girtin

Rêvebirê Weşana Giştî yê Bitlis Newsê û Serokê Cemiyeta Rojnamegeran a Bedlîsê Sînan Aygul çû Edliyeya Bedlîsê da ku beşdarî dozekê bibe. Li Edliyeyê bi hinceta ku der barê wî de biryara girtinê heyê, hat binçavkirin û girtin.

Aygul di 10ê Kanûna 2014an de di gotara xwe ya ku li ser malpera nûçeyan a bi navê "www.bitlisnews.com" weşîya de wekî AKPî yê Bedlîsê Vahit Kiler wekî "siyasetmedarê gur" bi nav kir. Li ser vê yêke doz lê hat vekirin. Bi hinceta ku "bi rêya çapemeniyê heqaret kiriye" hezar û 500 TL cezayê pereyî lê hat birîn. Dadgehê aşkerekirina darazê bi paş ve xist (HAGB) û ceza taloq kir.

Aygul ji ber ku di sala 2019an de bûyereke îstîsmara zayendî kiribû nûçe cezayê girtîgehê lê hatibû birîn. Piştî vê yekê cezayê pereyan ku berê lê hatibû birîn jî teqez bû. Lê belê Aygul ev pere ranezand û cezayên alternatîf red kirin. Li ser vê yekê ji aliyê Serdozgeriya Komarê ya Tetwanê ve der barê Aygul de biryara girtinê hat dayîn. Parêzerê wî raqihand ku li ser vê biryarê Aygul hatiye girtin û ew şandine girtîgehê.



Aygu di çarçoveya destûra Covid-19ê de di 14ê Îlona 2022an de hat berdan. Di 30ê Îlonê de destûra Aygu bi dawî dibe. Ger ev destûr bê dirêjkerin dê înfaza 75 rojan li derve temam bibe. Ger neyê dirêjkerin û Aygu cezayê pereyî nede dê dîsa bikeve girtîgehê.

14ê Îlonê, 2022

RTUKê li 3 bernameyên Halk TVyê ceza birî

Lijneya Bilind a Radyo û Televîzyonê (RTUK) ji bo 3 bernameyên cuda yê Halk TVyê biryara sekinandina bernameyan û cezayê pereyî yê îdarî da. Endamê RTUK'ê yê ji kotaya Partiya Komarî ya Gel (CHP) İlhan Taşçi li ser hesabê xwe yê twitterê biryarên cezayan parve kir.

Li Edlîyeya Diyarbekirê hestiyên Hakan Arslan ê ku li navçeya Sûrê ya Amedê di pevçûnan de jiyana xwe ji dest da, piştî 7 salan di tûr de radestî bavê wî kirin. Di bernameya Halk TVyê ya bi navê "Sözüm Var" (Gotina min heye) de ev bûyer hat rexnekirin. Ji ber vê rexnekirinê RTUKê bi hinceta ku "Xizmeta armancên terorê dike" ceza li Halk TVyê birî ku bernameya navborî 5 caran bê rawestandî bi ser de ji sedî 5 jî cezayê pereyî lê birî.

Her wiha ji ber ku rojnameger Ayşenur Arslan bi aborînas Mustafa Sönmez re di bernameya bi navê Medya Mahallesi de rexne li nêzikatiya Suleyman Soylu ya li dijî sûcan girt, bi hinceta ku Soylu biçûk xistiye ji sedî 3 cezayê pereyî lê hat birîn.

Sêyemîn cezayê ku li Halk TVyê hat birîn jî ji ber peyva "dewleta narko" ya Parlamenterê CHPyî Alî Mahîr Başarir bû. Başarir beşdarî bernameya "Sözüm Var" (Gotina min heye) bû û ev peyv bi kar anî. Li ser vê yekê ji sedî 3 cezayê pereyî hat birîn.

Cezayên îdarî yê RTUK'ê ji sedî 2 heta ji sedî 5ê dahata brut a kanala cezakerî ya meha borî diguhere.

15ê Îlonê, 2022

Lêpîrsînên li heqaretên li dijî serokomar di 7 salên dawî de 185 qat zêde bûne

Di 15ê Îlona 2022an da nûçeyek li ser medyaya civakî weşîya. Li gorî nûçeyê di derbarê kesên ku bi wêneyên Serokomar Recep Tayyîp Erdogan vîdyoya jimartina pereyan kişandine û weşandine de lêpîrsin hatiye destpêkirin.

Li gorî îstatîstîkên sala 2021ê yê Wezareta Dadê ya ji ber sûcê "heqareta li Serokomar" 33 hezar û 973 lêpîrsîn hatin vekirin. Ev hejmar di sala ku Erdogan hat hilbijartin de 184 bû û di nav 7 salan de 185 qat zêde bû. 305 kesên ku doz li wan hatin vekirin zarok in.